# LI KURDISTANÊ KEVNETORA ZEWACÊ/ ZEWICANDINÊ

## xeleka 2.



Diyar BOHTÎ

Di xeleka borî de me diyar kiribû ku zewac/zewicandin di gelek qonaxan re derbas dibe. Di wê xelekê de me du qonax rave kiribûn -qonaxa dîtina keçikê û qonaxa xwazgîniyê-. Lê di qonaxa xwazgîniyê de carna tiştên derveyî adetê civakê jî diqewimîn. Mînak, carna keçika mezin hebû lê ji ber bedewiya wê diçûn ya piçûk dixwestin. Di rewşên wisa de, bavê keçikê carna qebûl dikir, carna jî digot, heta ya mezin nezewicînim ya piçûk nadim. Lê dema ya piçûk didan, ji bo ya mezin dibû êşeke pir giran. Ji bo kurikan jî heman tişt hebû. Carna yê mezin digot, ez niha nazewicim, yê bin wî re dizewicandin, carna jî yê piçûk diçû yek direvand. Lê rewşên wisa kêm çêdibûn. Carna jî dema birayê mezin nedizewicîn, xwîşkên wan jî digotin, heta birayê min nezewice ez jî nazewicim. Bi taybetî dema dayîka wan ne sax bûya rewşeke wisa derdiket. Digot, ez bizewicim wê kî xizmeta wan bike. Di vê xelekê de ez ê ji qonaxa dezgirtîbûnê dest pê bikim.

## 3- QONAXA NÎŞANÎ Û DEZGIRTÎBÛNÊ

Piştî qonaxa xwazgîniyê, ango piştî ku bavê keçikê ji malbata kurik re digot, me keçika xwe da we li ser xêrê be, êdî keçik dibû bûka malbata kurik. Jixwe di dema xwazgîniyê de bavê keçikê bixwe digot, keçika me êdî bûka we ye. Ji wê saetê şûn ve êdî keçik û kurik dibûn dezgirtiyên hev. Li deverna jê dibêjin dergistî. Her du malbat jî dibûn xinamiyên hev. Niha jî heman gotin bi kar tê. Lê peyva xinamî li her herêma Kurdistanê bi kar nayê, bi giranî li herêma Serhedê û Xerza bi kar tê. Li herêmên din dibêjin em bûne mirovên hev, yan xizmên hev. Lê li nava hin eşîrên koçeran dibêjin, em bûne malmirovên hev. Mirovatî û xizmatî giştî ye, lê xinamî û malmirovî ji bo kesên bi dayîna jinan dibin xizmên hev tenê bi kar tên.

Piştî ku keçik û kurik dibûn dezgirtiyên hev, malbata kurik li gorî rewşa xwe ya aborî yan zêrek dixist stûyê keçikê, yan gustîlek dixistin tiliya wê. Yên dewlemend bûna gerdenî, bazin, guhar û hwd. ji bûka xwe re dibirin. Ji wan xişriyan re digotin nîşanî. Ango ew zêr nîşana wî qasî bûn ku keçik dezgirtî ye. Keçikê jî zêr bi awayekî wisa bi xwe ve dikirin, ku her kes bibîne da bizanin dezgirtî ye. Lê carna jê şerm dikirin gustîlê bixin tiliya xwe, yan zêran bi xwe ve bikin. Dayîkên wan bi zorê bi wan ve dikirin. (Di vir de dixwazim vê jî bîr bixim; di malan de keçên malê yên nezewicî û bûkên malê bi desmalên nixumandina serên xwe dihatin naskirin. Keçik piştî ku diçû mala zavê roja din kemika spî dida serê xwe. Ew nîşana wî qasî bû ku jina bimêr e. Lê kaçikan hemawî, şelpe yên bireng didan serê xwe.) Ji bilî xişriyan ji bo çêkirina kirasan qumaş, sol, kember û şelpe jî ji keçikê re dibirin. Li hin deverên Kurdistanê malbata keçikê jî gustîlek dixist tiliya kurik. Lê ev pir kêm bû. Ango çandeke wisa giştî tinebû.

Ev qonaxa dezgirtîbûnê carna kurt, carna dirêj dibû. Kurtbûn û dirêjbûna wê jî ji bo çend sedeman bû. Ya yekê, dema kurik leşker bûya dem dirêj dibû. Ya duduyan, eger keçik piçûk bûya, yan keçik û kurik her du jî piçûk bûna, hingê jî dem dirêj dibû. Lê carna keçik bi piçûkayî dibirin. Malbata wê digot, bila kurik niha destê xwe nediyê heta mezin bû. Ya sisiyan, ji ber qelen dem dirêj dibû. Ku malbata kurik xizan bûya di demeke kurt de nikariya qelen peyda bike. Carna heta heft salan jî dem dirêj dibû. Bavê keçikê ji kurik re digot, ku tu heft salan şivaniya pezê me bikî ezê keça xwe bidim te. Ew şivanî diket şûna qelen. Ew jî dibû sedema dirêjbûna demê. Çarna ji ber nexweşiya yek ji her du



dezgirtiyan dem dirêj dibû. Carna jî di navbera her du malbatan de pirsgirêk derdiketin, heta çareser nebûna dawet nedihat kirin. Carna jî eger birayê keçikê bidezgirtî bûya, heta nezewicîbûya, malbatê keça xwe nedişand. Lê dirêjbûna vê qonaxê ji bo her du aliyan jî ne baş bû. Dema dirêj dibû di nava civakê de hem gotegot belav dibûn, hem civakê di nava xwe de digot, ‘ava sekinî genî dibe.’ Her yekî li cem xwe sedemek ji dirêjkirina demê re dianî û şîrove dikir. Wê rewşê bi taybetî bandor li kurik û keçikê pir dikir. Bendewarî û nediyariya dawiya vê qonaxê her du jî pir xemgîn dikirin û diêşandin. Lê eger ev sedem tinebûna, di nava çend mehan de bûk -bi piranî di nava salekê de dawet dihat kirin- vediguhestin. Carna di nava çend hefteyan de jî bûk diguhestin.

Di vê mijarê de xaleke din ya balkêş heye ku li hinek herêmên Kurdistanê dema dezgirtîbûnê bi ser deh salan jî diket. Ew jî bi çend rengan bû û wiha bû: Ya yekê, hin malbatên dostên hev, dema ji malbatekê re keçik, ji ya din re kurik dibûn, hê roja jidayîkbûnê yan piştî çend rojan, yan çend mehan soz ji hev distandin. Piştî hingê êdî ew keçik û kurik yên hev bûn û piçûk be jî, nîşan bi keçikê ve dikirin. Ji vê rewşa nîşanê re li hin herêmên Kurdistanê dibêjin, niqirkirî. Carna hê zarok di zikê diya xwe de soz ji hev distandin. Digotin, eger keçik be ji kurikê me re ye. Ya duduyan,

yên her du malbatan jî hem zarokên keçîn hem yên lawîn hebûn. Hê di wî temenî de soz ji hev distandin û her çar zarok dibûn dezgirtiyên hev. Ji wî awayî re jî digotin pêguherî. (Di xelekeke din de emê bi taybetî li ser mijara pêguheriyê rawestin.) Ya sisiyan, ku keçika malbetekê hebûya ya malbata din tinebûya, bavê keçika zarok digot, ezê keçika xwe bidim we lê hûn deyndarên me ne, çi dema keçikek ji we re çêbe ji me re ye. Bi wî awayî li hev dihatin. Di van rewşan tevan de, dema dezgirtîbûnê heta deh, pazdeh salan jî dirêj dibû. Bêguman eger ti pirsgirêk derneketibûna. Lewre carna dema keçik û kurik mezin dibûn, yan keçikê digot, ez naxwazim yan kurik digot. Di rewşên wisa de yan bi zorê dizewicandin, yan jî betal dikirin.

Di wê qonaxê de di rewşa her du dezgirtiyan de guhertin çêdibû. Kurik êdî bi çavê zilaman li xwe dinêrî. Axaftin, kiryar û danûstandinên wî ji yên berî dezgirtîbûnê cudatir dibûn. Ji bo karê malbatê jî ji berê pirtir berpirsiyarî digirt ser milê xwe. Lê



rewşa keçikê ji ya kurik cudatir bû. Lewre çi kurt çi dirêj wê piştî demekê ji malbata xwe qut bibûya, biçûya maleke din. Weke din êdî bûka xelkê bû. Malbata kurik bi navê namûsa xwe lê dinêrî. Ji ber wê eger berî hingê kirasê wê kurt bûya, li ser daxwaziya malbata kurik êdî dirêj dikir. Weke berê di liv û tevgera xwe de ne azad bû. Weke berê diviya li her cihî nekene û pir neaxive.

Di vê mijarê de biwêjek jî heye. Dibêjin, qîzika dezgirtî weke dîzika devgirtî. Ango çawa ku ti kes nizane ka di dîzika devgirtî de çi heye, divê ti kes nizanibe ka di hiş û hundirê keçika dezgirtî de jî çi heye. Heta eger navê keçikê ne li gorî malbata kurik bûya, piştî ku dibû dezgirtî navê wê jî diguhertin. Dikarim ji malbata xwe mînaka vê bidim. Keçikeke gundiya me ji birayê min yê ji min mezintir re xwestin. Navê wê Nêrgiz bû. Piştî xwazgîniyê bavê min got, Nêrgiz navekî pir beredayî ye, bila navê wê Cewahir be. (Ango erebî be) Piştî hingê navê wê bû Cewahir.

Di vê qonaxa dezgirtîbûnê de, eger her du dezgirtî li heman gundî bûna, têkiliya navbera wan jî dihat guhertin. Berî ku bibin dezgirtiyên hev, eger cîranên hev, yan xizmên hev bûna, heta ne her du bûna jî, li gorî pêdiviyê bi hev re diaxivîn. Lê piştî ku dibûn dezgirtiyên hev têkilî û axaftin yekser qut dibûn. Li gorî adetê civakê diviya neyên cem hev



û bi hev re neaxivin. Heta berî hingê dibe ku kurik biçûya mala malbata keçikê, lê piştî hingê mecbûrî ne tê de ew çûyîn jî qut dibû.

Li gorî hişmendiya civakê berî zewacê çûna mala bavê keçikê ne baş bû. Carna hevalên kurik ji bo heskirinê, bi zorê dibirin mala bavê keçikê. Lê her du malbat jî pê ne xweş dibûn, digotin, wê ji hev çavreş bibin. Lê malbata keçikê ji bo mijareke din nedixwest berî guhestinê hev bibînin. Dihizirîn ku hev bibînin, tiştna bikin -ku tiştek nekiribûna jî wê ew nav li pey wan biketa- û pişt re dev jê berdin wê keçika wan bextreş bibe êdî ti kes neçe nexwaze. Lê li hinek deveran piştî nîşaniyê malbata keçikê ji bo xwarinê bi awayekî fermî zavayê xwe vedixwend malê. Li ser vexwendinê zavayê wan çend heval yan xizmên xwe jî bi xwe re dibirin diçûn. Piştî xwarinê zava gustîlik dida keçikê. Lê ev adet li her cihî tinebû û ne çanda giştî bû. Li hinek deveran jî tersê vî adetî bû; malbata kurik malbata keçikê agahdar dikir, digotin, em dixwazin werin serdana we. Piştî şandina agahiyê kurik û dayîka xwe, yan çend kesin din bi hev re diçûn. Hem tev de xwarin dixwarin, hem eger rewşa malbata kurik ya aborî baş bûya ji bo keçikê xelat jî bi xwe re dibirin.

## 4- QONAXA ŞÎRANIYÊ

Piştî ku qonaxa nîşaniyê diqediya û qonaxa dezgirtîbûnê dest pê dikir, malbata kurik amadekariya şîraniyê dikir. Şîranî dihat wateya ragihandina mijarê. Xwestina keçikê, erêkirina malbata wê û nîşankirina wê ji aliyê her kesî ve nedihat zanîn. Yên derdora her du malbatan û cîranên wan tenê agahdar dibûn. Lê piştî ku şîranî dihat dayîn êdî mijar ji aliyê her kesî ve dihat zanîn. Jixwe daxwaziya malbatan jî ew bû ku mijarê ji her kesî re ragihînin. Ku her kesî bizaniya keçik dezgirtî ye kesên berî hingê niyeta wan ya xwestinê yan dilê wê bixin xwe hebûya jî, bi şîraniyê re hêviyên xwe dibirîn û ti kesî newêriya bi çavekî xirab jî lê binêre. Lewre ha çavê xwe berdabûna keçika dezgirtî ha hemsera hina. Ku tiştek wisa bibûya mêr dihatin kuştin. Lê carna keçika dezgirtî bi hina re direviya. Ev mijar jî wiha bû: Yan berê ji hev hes dikirin, lê bavê wê nedida, yan keçikê ji kurik hes nedikir û çare di revê de didît. Di rewşên wisa de hem malbata keçikê, hem ya kurik ku ji destê wan bihata serî li her

rêbazê didan, lê eger bêdesthilat bûna, malên xwe ji gund bar dikirin, yan jî bi rengekî stûxwar li gundê xwe diman. Lewre ji bo her du malbatan jî rûreşiyeke pir mezin bû. Bi taybetî malbata kurik. Êdî şerm dikirin derkevin nava civakê.

Lê dema şîraniyê ne diyar bû. Piştî nîşaniyê carna di nava çend hefteyan de şîranî didan, carna meh derbas dibûn, carna jî piştî nişaniyê bi salekê şîranî didan. Weke dawetê sedemên dirêjbûna şîraniyê jî pir bûn. Sedem geh, demsal bû -lewre demsala bihar û havînê û li hin herman jî demsala payîzê jî dema kar û xebatê bû. Ji ber wê bi giranî şîranî û dawet dawiya payîzê û demsala zivistanê çêdibûn.

## DEMA DAYÎNA ŞÎRANIYÊ

Dem û rêbaza şîraniyê wiha bû: Eger keçik ji gundê kurik bûya, roja berî şîraniyê du, sê xortên xizmên kurik mal bi mal li gund digeriyan, digotin, sibe şîraniya me ya hûn vexwendî ne. Roja din gundî tev li mala malbata keçikê kom dibûn. Li hinek deveran di dema şîraniyê de mitirb dianîn li dahol û zirneyê jî dixistin. Lê bi piranî bê dahol û zirne bû. Lê eger malbata keçikê li gundekî din bûya, dîsa mal bi mal digeriyan tev vedixwendin, lê gundî tev nediçûn. Serê her bavikî yek, dudu diçûn. Malbata keçikê jî gazî xizmên xwe tenê dikir.

Tiştên malbata kurik ji bo şîraniyê



dibirin, li gorî demsal û herêman dihatin guhertin. Li herêma Bohta bi piranî şîranî helaw bû. Miqdarê helawê jî li gorî piçûkbûn û mezinbûna gund bû. Herî kêm du teneke -her teneke bîst kîlo bû- dibirin. Lê carna ser çar û pênc tenekeyan jî diket. Malbata keçikê tenekeyek ji xwe re hildianî ya mayî tev di şîraniyê de dihat xwarin. Ciyê ku helaw dihat dayîn, adet bû nanê şkeva çêdikirin. Lewre xwarina helawê bi nanê şkeva ji nanê hiletî hêsantir bû. Lê du nifşên helawê jî hebûn. Nifşek jê, ji ber ku kuncî di navê de hebûn pir xweş bû, di devê mirov de diherifî. Nifşek jî ji ber ku kuncî di navê de tinebûn yan pir kêm bûn, hem bêtam bû, hem dibû weke benîşt bi didan û pidûyên mirov ve dizeliqî, bi zorê jê vedibû. Li hinek herêman şerbeta dimsê, xwoşav û şekirê di nava kaxizan de bûn. Li hinek herêman, berhemên rezan bûn; weke mewîj, benî, basîq û helîlê. Li hinek herêman goz, behîv, mewîj û tiştên wisa bûn. Lê li nava koçeran ji ber ku derfetên wan kêm bûn, mewîj û hêjîrên hişk bûn. Li hin herêmên Kurdistanê li şûna peyva

şîraniyê digotin rûvekirin. Ango êdî keçikê dikarî rûyê xwe ji dezgirtiyê xwe re veke.

## QELEN

Di mijara zewac û zewicandinê de yek ji babetên herî girîng babeta qelen bû. Li hin herêmên Kurdistanê li şûna peyva qelen peyva next bi kar tînin. Li hin herêman jî dibêjin şîrbayî. Ango bihayê şîr, berdêla şîr. Li hin herêman carna derveyî qelen, dayîka keçikê digot, divê hûn heqê şîrê min jî bidin min. Lê ev pir kêm bû.

Di xeleka borî de jî me behsa dîroka qelen kiribû. Qelen çawa bûye çand, çavkaniya wê çi ye? Me diyar kiribû ku vê mijarê bi dayîna kevirên biqîmet dest pê kiriye, pişt re li şûna keviran zêr, zîv û hwd. ji aliyê malbata kurik ve hatine dayîn. Lê ku mirov ji wê re bêje qelen wê ne pir rast be. Lewre dayîna wan kevir, zêr û zîvan ne mecbûrî bû, weke xelatan bûn. Lê qelen mecbûrî bû. İhtimala herî xurt ew e ku qelen ji çanda Islamê hatibe û di nava Kurdan de jî bûbe çand. Lewre li gorî Islamê mehrulmisil heye. Ango mafê keçikê yê mehrê (nîkah). Mafê keçikê heye di berdêla mehra xwe de ji kesê ku pê re bizewice malê dinyayê bixwaze. Ev mafê mehrê dibe ku dirav bin, dibe ku zêr bin, dibe xanî, zevî û hwd. bin. Ew zêr jî dibe ku piştî dezgirtîbûnê dabûnê, dibe ku pişt re bidinê. Wateya mehrulmisilê wiha ye: Piştî zewacê eger hemser hev berdin ew tişt tev ji jinikê re dimînin. Wisa xuya dike ku di nava demê de malbata keçikê ev mehrulmisil kiriye qelen û ji bilî hinek xelatan tiştekî jî nade keçikê. Sînor jî ji mehrulmislê re nîne. Keçik dikare milyarek doleran jî bixwaze. Mehr li ser wan berdêlan tê birîn. Ew berdêl tev yên keçikê ne. Ne bav, ne dê, ne bira mafê ti kesî nîne jê bistîne. Di nava Kurdan de mixabin niha jî qelen heye û mecbûrî ye. Heta qelenê herî zêde Kurdên Êzîdî yên çûyîn Ewropa ji hev distandin. Lê berî niha li Şingalê şêx û rûspiyên Êzîdiyan miqdarê qelen diyar kiribûn. Bi ser wî miqdarî re ti kesî nedixwest û ew miqdar jî her kesî dikarî bide. Mixabin piştî fermana dawiyê ya li ser Şingalê pergala wan jî serûbin bû.

## DEMA VEBIRÎNA QELEN

Dema vebirîna qelen ne diyar bû. Sê demên wê hebûn. Ya yekê, di dema xwazgîniyê de bû. Piştî ku bavê keçikê erê dikir, digot ezê keçika xwe bidim we, malbata kurik pirsa miqdarê qelen jê dikir. Carna bi saetan li ber hev didan heta ku li hev dihatin. Bi giranî destpêkê bavê keçikê qelen pir dixwest. Lewre li gorî hişmendiyê qîmetê keçikê li gorî hindikbûn û pirbûna qelen bû. Bavê keçikê hem ji bo mijara aborî dixwest pir bistîne, hem da civak bêje keça xwe erzan neda. Gelek caran bavê keçikê di nava civakê

de bi dengê bilind û bi serbilindî digot, evqas çek, evqas dirav, evqas heywan û hwd. li ser pişta keça min in. Kî van hemûyan bide bila kerem bike were bixwaze. Weke din keçikê jî dixwest qelenê wê giran be. Da di nava hevalên xwe de serê wê nizim nebe, nebêjin qelenê te kêm e. Keçika qelenê wê giran bûya xwe di ser yên din re didît. Lewre qelenê giran ji bo wê jî serbilindî û rûmeteke pir mezin bû. Li hin herêman adeteke din jî hebû. Eger keçik quranxwîn bûya, qelenê wê ji yên din pirtir bû.

Lê carna şeva xwazgîniyê di mijara qelen de li hev nedikirin. Pişt re bavê keçikê hin mirovên ku texmîn dikir wê bavê keçikê ji bo xatirê wan kêm bike, bi xwe re dibirin. Carna bavê keçikê dîsa ji ya xwe nedihat xwarê, digot, ez qurûşekê jî kêm nakim, tu dixwazî ev e, tu naxwazî tu dizanî. Lê bi piranî xatirê mirovên çûyîn dihat girtin.

Ya duduyan, piştî xwazgînî û nîşanê bû. Piştî ku bavê keçikê erê dikir û malbata kurik nîşan bi keçikê ve dikirin, ji bo vebirîna qelen çend rûspî bi xwe re dibirin diçûn mala bavê keçikê. Bi giranî heta ku li hev nekiribûna ranedibûn.

Ya sisiyan, di dema dayîna şîraniyê de bû. Berî ku dest bi xwarina şîraniyê bikin, rûspiyan ji bavê keçikê re digot, ka şekirekî bişkîne. Digotin, heta tu tiştekî maqûl ji me re nebêjî em tiştekî naxwin. Yekî digot, hinekê bide xatirê min, yekî din digot, hinekê bide xatirê min jî heta bi awayekî li hev dikirin. Her kesî alîkariya bavê kurik dikir.

Berî ku pereyên kaxiz û hesin derkevin zêr dihatin dayîn. Bavê keçikê digot, hûnê evqas zêr bidin min. Lê piştî derketina pereyên kaxiz û yên hesin, êdî pere dixwestin. Lê hina hem pere hem tiştin din jî -weke çek, heywan, cilûberg û hwd.- dixwestin. Lê zêrên ji bo keçikê dixwestin derveyî qelen bûn. Ew yên keçikê bûn. Ji bilî yên malbata keçikê ji xwe û keçikê re dixwestin, ji bo xalê wê jî xelat dihat xwestin. Xelata xal li gorî rewşê û herêman dihat guhertin. Hina demance dixwest, hina qundire, hina saet, hina tiştên cuda dixwestin. Bi vî awayî qonaxa nîşanî, şîranî û qelen jî diqediya. Lê eger malbata kurik xizan bûya carna hin ji qelen bi deyn dima heta piştî veguhestina keçikê. Piştî ku dawet diqediya, hina qelenê mayî dida, hina digot, pereyên me nînin em nikarim bidin. Di rewşên wisa de tiştekî ku malbata keçikê bike nedima. Lê êdî pir zêde nedikirin pirsgirêk jî. Lewre êdî keçik û kurik bûbûn hemserên hev. Pereyên mayîn didan xatirê keça xwe.

*Wê dewam bike...*